Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çileyê Pêşîn / 15 - 12 - 2021 Kurdistan-Hejmar (211) www.pdk-s.com

# Revandina zarokan tawan e

Kurdistan **Dîlan Ebdulbaqî**



Di vê dema dawî grûpên ser bi PYD hejmareke zarokên temenên wan di jêr 18 salan de ji gelek deverên Kurdistana Sûriyê revandine, û ew berev cihên nediyar ve birine, bê ku meriv û malbatên wan werin agahdarkirin. Dayika yek ji wan keçên hatine revandina ji Rojnameya Kurdistan re got, keça wan ji aliyê grûpa bi navê ciwanên şoreşger hatiye revandin û ew cihê wê nizanin, û wan çend caran serdana aliyên peywendîdar jî kiriye lê ti aliyekî bersiva wan nedaye, herwiha daxwaz ji hemû aliyan dike alîkariya wan bike daku keça wan vegere mal ji berk u zarok e û ew bi xwe jî nexweş e. Welatiyek ku beşdarî di xwepêşandanên dijî revandina zarokan li Qamişlokiribû ji Rojnameya Kurdistan re got, hêzên ser bi PYD bi awayekî hovane êrîşî me kirin û nehiştin em daxwaza mafên xwe bikin, divê zarokên me di zûtirîn dem de serbest berdin, ev yek li dijî pransîpên mafên mirovane.

# PDK-S : Pêwîstiya rewşa Efrîn û Serêkaniyê bi çareseriyên bilez heye



Kurdistan-Bidûvçûn

Partiya Demokrata Kurdistan – Sûriya (PDK-S) radigihîne, pêwîstiya rewşa Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî û binpêkirinên grûpên çekdaran li wan herêman, bi çareseriyên bilez heye.
Mekteba Siyasiya PDK-Sê raporta xwe ya siyasî belav kir û tê de derbarê pirsa diyaloga di navbera rêjîma Sûriyê û PYDê de ragihand, “Tiştê ku derbarê diyalog û danûstandina di navbera PYD û rejîmê de tê behskirin, ji bilî proseya “hesapgirtinê” ne tiştekî din e. Herwiha ew ji mijarên mafan û çareserkirina pirsgirêkên bingehîn û nakeve çarçoveya çareseriya siyasî ya kirîza Sûriyê ya li gorî biryarên navdewletî jî dûr e .”
Li ser mana hêzên Amerîkî li Rojavayê Kurdistanê, Poltburoya PDK-Sê destnîşan kir “Amerîka rijd e ku hêzên xwe herî kêm du salan li deverên rojhilatê Firatê bihêle - li gorî jêderên wê-û ew bawer dike ku hîn erkên wê bidawî nebûne, bi taybet di mijara terora DAIŞê de û çavdêrîkirina berjewendiyên xwe yên çavkaniyên aborî yên wekî neft, gaz û hwd.”
Derbarê diyaloga Kurdî jî di raporta PDK-Sê de hat: “Hîn jî niyaza Amerîka ya berdewamkirina hewlên ji bo lihevhatina Kurdî hene, bi riya jinûve destpêkirina danûstandinên rawestayî di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) û Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) de.”
Herwiha PDK-Sê di wê derbarê de got jî: “Diyaloga Kurdî zêdetirî salekê ye hatiye rawestandin, ew jî bi sedema kiryarên çekdarên PYDê yên berdewam û binpêkirina wan ji “rêkeftina perensîpan” a di navbera fermandariya HSD û aliyê Amerîkî de hatiye îmzekirin.”
Li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê PDK-S dibêje: “Hîn jî xelk rastî zehmetî û qeyranan zêdetir dibe, çi ji ber zêdebûna berdewam a nirxê kelûpelan û debara jiyanê û çi ji ber çewsandina ku ji aliyê komên çekdar ên ser bi PYD ve li dijî xelkê, partiyan û ENKSê tê kirin, wek leşkerkirina kesên temen biçûk, şewitandina ofîsan û gefxwarina li malbatên Pêşmergeyên Roj ku ev kiryar bi ti awayî nakevin berjewendiyên gel û li dijî pîvan û yasayên navdewletî ne.”
Polîtburoya PDKê li ser rewşa Efrîn û Serokê Kaniyê tekez kir: “Êş û azarên gelê me yên li Efrîn, Serêkaniyê û Gerê Spî hîn jî berdewam in, hem ji ber sedemên jiyanê û hem jî ji ber binpêkirinên komên çekdar ên ser bi dewleta Tirkiyê ve ku pêwîstiya wan herêman bi çareseriyên bilez hene.” Herwiha diyar kir jî, “Di civîna dawî de ligel aliyê Tirkiyê tekezî li ser çareserkirina van pirsgirêkan hat kirin, herwiha kar ji bo nehîştina astengiyên li pêşiya vegera koçberan ser mal û milkên xwe û çareserkirina zulm û zordariyên ku bi sedema binpêkirinan gihîştiye welatiyan, tê kirin.”
Di vê dema dawî de rewşa Efrînê gelekî xerab bûye, û grûpên çekdar astengiyên mezin ji welatiyên Kurd re dirust dike, heta ku neçar bibin û cih û mal û milkên xwe bi cih bihêlin.Welatiyekî Efrînê li ser rewşa bajarê xwe wiha dibêje, Pêwîste ENKS û PDK-S bilez rewşa herêma me çareser bikin û xelkê ji zilm û sitema grûpên çekdar rizgar bikin, û rewşa Efrînê berev başbûnê ve bibin, pêwîste ENKS ofîsên xwe bi fermî veke heta ku ti aliyek nikaribe êrîşî xelkê bike yan sitemê lê bike, herwiha divê ENKS ligel Tikriyê û civaka navdewletî vê pirsgirêkê çareser bike, heta ku xelkê Efrînê yên li kampan dimînin vegerin ser mal milkên xwe.
Welatiyekî Serêkaniyê jî ji rojnameya Kurdistan re got, rewşa xelkê me li Hesekê di nava kampan de xerab e û pêwîstiya me bi alîkariyê heye, mal û milkên me li Serêkaniyê hatiye talankirin, daxwazê ji aliyên peywendîdar û civaka navdewletî dikin çareseriyekê ji me re bibînin.



# PYD û girûpên ser bi wê ve di binpêkirina mafên mirovan de berdewam in

Kurdistan-Ehmed Omer



ENKSê di roja Cîhanî ya Mafên Mirovan de bang li Netewên Yekgirtî û civaka navdewletî dike, binpêkirina li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî rawestînin û ji PYDê jî daxwaz dike girtiyên siyasî û zarokên revandî serbest berde. Bi boneya Roja Cîhanî ya Mafê Miorovan, Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) daxuyaniyek weşand û tê de ragihand, "Gelê Kurd ku di dîroka xwe de li ser destê rejîmên dewletên Kurdistan perçe kirine rastî çewsandinên netewî yên hovane hatine û ji mafên xwe yên netewî û mirovî yên herî bingehîn bêpar mane û li dijî wî şerên qirkirinê hatin meşandin." ENKSê destnîşan dike jî, "Li Sûriyê jî, gelê Sûriyê bi giştî rastî zor û zulmê ji aliyê rejîmên li pey hev hatine. Di salên şoreşa Sûriyê de jî, hemû pêkhateyên netewî û cvakî li ser destê rêjîm û hêzên terorê rastî zulm û zordariyên zêde hatin û para gelê Kurd ji van zulm û zordariyê ya herî zêde bû." ENKS di beşeke din a daxuyaniya xwe de dibêje: "Xelkê Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî jî rastî binpêkirinên hovane li ser destê grûpên çekdaran tên, wek kuştin, revandin, koçberkirin, destdanîna ser mal û milkên welatiyan û proseya guhartina demografî." Herwiha ENKSê bang li civaka navdewletî, Netewên Yekgirtî, rêxistinên mafên mirovan ên pêwendîdar û Tirkiyê dike, van binpêkirinên Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî rawestînin û çekdaran ji van bajaran derxin, herwiha alîkariya welatiyan bikin da ku vegerin mal û milkên xwe û îdareya van bajaran radestê xelkê wan bike. Herwiha ENKSê di daxuyaniya xwe de amaje bi kiryarên PYDê yên wekî revandin û biçekirina zarokan û girtina welatiyan û çalakvanên siyasî kir û daxwaz ji vê partiyê kir, girtî û zarokan serbest berde. ENKS bang li Netewên Yekbûyî, rêxistinên mafên mirovan û welatên pêwendîdar dike ku kar bikin ji bo azadkirina bi hezaran girtiyên Sûrî di zîndan û girtîgehên rejîmê de bike. Mihemed Elî wiha li ser binpêkirina mafên microvan li Kurdistana Sûriyê dibêje, Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ku destikê PKK li Kurdistana Sûriyê di binpêkirina mafên microvan de berdewam e, ew jî di rêya grûpên ser bi wê ve wek rêxistina bi navê ciwanên şoreşger ku ev grûp berdewam êrîşî xelkên sivîl û ofîsên partiyan dike, herwiha ciwanan direvîn e û zarokan jî ji bo leşkeriya neçar dibe, û ev yek bi xwe jî tawane li dijî mirovatiyê. Heta niha bi sedan kes li cem vê partiyê û grûpên ser bi wê ve windayî ne û ti kes nizane ew li ku ne û li çi deverê girtî, tevî ku Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê li ser maseya danûstandinan daxawza van kesan kiriye, lê aliyê din xwe bê deng dike û çarenivîsa van kesan eşkere nake, ev partî tawanên dike hemû jî dijî alîgirên ENKS ne, bi rastî di vê dema dawî de kiryarên PYD û grûpên ser bi wê v enema têne qebûlkirin û divê sînorek ji wan re were danîn heta ku xelkê me jiyaneke xweş derbas bike. Welatiyek li ser pirsa abûrî jî wiha dibêje, PYD jibilî girtin û revandina xelkê, di ware abûrî de jî tawaneke mezin li dijî xelkê me encamp dide, kelûpel û nav û sotmenî hemû buha ne û xelk nikare bikre, û ev bi xwe jî tawaneke li dijî mirovahiyê ye, ev fişareke li ser xelkê me ye li Kurdistana Sûriyê het ku mal û milkên xwe bi cih bihêlin û koçber bibin û ev jî karesateke mezin e ku derheqê xelkê me tê kirin û pêwîste çareseriyeke bilez jê re bê dîtin.



# Şêx Ebdulselam Barzanî têkoşerekî bêhempa





Kurdistan

Dîroka 14'ê kanûna yekem di dîroka kurdan de xwediyê ciheke girîng û rûpeleke reş e. Ji ber rêberekî kurd ê welatparêz û rewşenbîr di 14'ê Berfenbara 1914'ê de hatiye darvekirin. Ev rêber, Şêx Ebduselam Barzanî ye ku ji Dewleta Osmaniyan xwestiye ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî. Di dîroka kurdan de gelek mînakên darvekirina rêberan hene û yek ji van jî darvekirina Şêx Ebdulselam Barzanî ye ku bi mêrxasî, welatparêzî û mirovhezî ya xwe dihate nasîn. Şêx Ebdulselam Barzanî di nava dîroka netewî ya kurdan de xwediyê ciheke hêja ye. Ji ber ku 1907'an de Şêx Ebdulselam Barzanî ji navenda Dewleta Osmaniyan re nameyek dişîne û daxwaz dike ku mafên kurdan ên xwezayî û netewî werin naskirin. Lêkolîner Kerem Serhedî amaje dike ku ev yek dibe sedem ku Şêx Ebdulselam Barzanî ji aliyê Osmaniyan ve wekî gefekê were dîtin. Şêx Ebdulselam Barzanî, birayê Mele Mistefa Barzanî yê mezin e û li ber çavê Mele Mistefa Barzanî tê darvekirin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî biryar dide ku ew ê derkeve çiyayên Kurdistanê û ew bibe xwarina gur û roviyan jî ew ê nekeve destê dijmin û dagirkeran .

Şêx Ebdulselam Barzanî ji aliyê parêzgarê Musilê Suleyman Nazîf ve ku ew bi xwe ji Diyarbekirê ye hate darvekirin. Lê niha hêzên cîhanî ji bo rizgarkirina Musilê alîkariyê ji neviyên Şêx Ebdulselam Barzanî dixwazin.Her wiha Başûrê Kurdistanê jî bi perspektîfa Şêx Evdilselam Barzanî ber bi serxwebûnê ve diçe.

# Fotograferekî Kurd wek baştirînê sala 2021 hat hilbijartin

Kurdistan-Bidûvçûn

Wênekêşê Kurd Mehmet Masum Suer, di pêşbirka wêneyên cihên dîrokî ya sala 2021 ya navnetewî (Historic Photographer of the Year 2021) de di nav 40 wênekêşên herî baş yên cihanê de hate hilbijartin. Suer, bi wêneyê xwe yê peykerê Qralên Kommagene ku li bajarê Semsûr'ê (Adiyaman) li sere çiyayê Nemrût kişandibû ev xelat vergirt. Suer, di sala 2017'yan de jî di heman pêşbirkê de bi 2 wêneyên xwe yên ji Amedê din av 40 wêneyên herî baş de cih girtibû. Wênekêşê navnetewî Mehmet Masum Suer, bi 26 wêneyên xwe yên ji bajarên Wan, Riha, Amed, Heskêf û Semsûr'ê beşdarî pêşbirkê bû. Belê wêneyê wî yê ji Semsûrê ku di sala 2015'yan de kişandibû ji aliye jüriye ve balkêş hate dîtin. Di vî wêneyê Suer de, peykerên du qralên Kommagene yên dîrokî di nav berfê de xuya dikin. Di pêşbirka ku li Brîtanyayê her sal tê lidarxistin de wênekêşê Brîtanî Steve Liddiard bi wêneyê xwe yê ku li Galler'ê kişandibû xelata wênekêşê sala 2021'an yê herî baş vergirt. Di pêşbirka ku ji her welatê cihanê gellek wênekêş bi hezaran wêneyê xwe beşdar bibûn de 40 wênêyên ku man fînalê jî, weke wêneyên herî baş yên sala 2021'an ve hatin hilbijartin. Pêşbirk ji aliyê History Hit TV, Sky History TV, saziya parastina xweza û derdorê ya Brîtanya ya bi navê Historic England, Komeleya Hunera Wêne û Dîrokê AHFAP û saziya bi navê Trip Historic ve tê emade kirin. Di encama pêşbirkê de wêneyên ku xelat vergirtin û wêneyê Suer jî di nav wan de bû li gelek welatên cîhanê de, di serî de ji aliyê CNN, BBC, Ajansa Rûsya Spûtnîk û gelek televizyon, rojname û malperên nûçeyan ve hatin weşandin û parve kirin. Medya ya Brîtanya, Turkiye û Iranê jî cihekî fireh da van wêneyan. Wênekêşê Kurd Suer jî bi wêneyê xwe di nav van wênekêşan de cih girt. Suer, derbarê vê serkeftina xwe de wiha axivî: "Heta îro min di gelek pêşbirkên navnetewî de gelek xelat vergirtin. Lê ji ber ku di pêşbirkêk wiha bi prestij de ev cara duyemîne ku wêneyê min dikeve nav 40 wêneyên hêrî baş yên salê de ez gelekî serbilind û kêfxweş im. Bi vê pêşbikê te armanc kirin ku cih û warên dîrokî bi rêya medyaye bi cihanê bê nasandin. Ji berk u ev du carin vê derfetê bidest dixim û berhemen dîrokî yên welatê xwe bi cihanê didim nasîn ez gelekî bextewer im."




